Hevpeyvînek li gel hunermend Xêro Ebas

Nûşîn Bêcirmanî

Sitranbêjê kurd, hunermend XÊRO EBAS, yek ji hunermendên kurd li derveyî welêt dijîn, ewî, rêça xwe di warê sitrana kurdî ya nûjen de qelaştiye, bi deng û awaza xwe, di wê rêyê re diçe. Li gundê Dugirê, li Cizîrê, em lê bûne mêvan, lê belê, wî dît ku em xwediyên male ne û ew mêvanê me ye...Bi singeke fireh, bi şahî û kêfxweşî guhdariya pirsên me kir û ew bersivandin.

Pirs : Hunermend xêro ebas ,bi navê weşana Newroz em bixêrhatina te dikin ku tu ji derve hatî welêt , nav kes û xelkên xwe.

Bersiv : Ez gelekî kêfxweş im bi hatina we .

Pirs : Eger tu karibî, xwe ji xwendevanên Newrozê re bidî naskirin :

Bersiv : Ez xêro Ebbas im ,ji kurdê cezîrê me, li gundê Dugirê ji dayik bûme, min li wir jiyana xwe bûrand ta ku ez derketim derveyî welêt , û ez bi hêvî me ku ez li gorî daxwazên we bim û li gorî navê Dugirê bim çimkî di demekê de Dugirê gelek lehingên kurd hembêz kirin.

Pirs : Îro tu li ku bi cî dibe ?.

Bersiv : Ji sala 1989 an ve ez çûme Ewropa li bajarê Axin li Elmanya dimînim .

Pirs : Gelo berî ku tu herî derveyî welêt, te pîş bi hunerê dikir?.

Bersiv : Na, lê keyfa min jêre dihat û li gorî nêrîn û şopa malbata xwe, min nikarîbû ku pîş bi huner kiriba , çimkî lê dinêrîn weke mitirb, û nedihate bîra min ku ezê bighim vê radeyê, piştî ez çûme Ewropa bandora malê dûrî min ket û min dest bi hunerê kir .

Pirs : Destpêka te ya hunerî çawa bû,û kengî bû? .

Bersiv : Di sala 1988 an de, koma Berxwedan pêşwaziya min kirin , kêfa xort û qîzên wê, ji min re hat , min bi tembûra xwe di pirovyekê de beşdarî kir , min strand, ji wan re gotin . dengê te xweş e , dûvre wan arîkariya min kirin ku min beşdarî di festîvalekê de bistirênim .

Lê min di sala 1991 ê de dev ji wan berda, çimkî min dît ezê bimînim li gor wan . di sala 1994-1995 an de, ez serbixwe derketim , û min strand hêdî ..hêdî .

Pirs : Kengî te kasêta xwe ya yekem derxist ?.

Bersiv : Di sala 1998 an de min derxist .

Pirs : Helbestvanên ku gotin dane te kî ne? .

Bersiv : Ebbas Ehmed - Ronî Xelo - Mihemed Xelîl .

Pirs : Ta kîjan radeyê stirana kurdî bi pêşve çûye?

Bersiv : gereke em van rengê nû, ji stiranan **Rok – Hart – Bilûz** bistirênin, ji ber kurdên me yên Ewropa xort û qîzên wan, ne amade ne ku guh bidne stirana kilasîk, ji ber civaka wir van rengên nû dixwaze .

Gereke xortê me yê nû sûdê ji şaşîtiyên me bikin û van şêweyan bistirênin . Nimûne komek heye bi navê /Şoreş / van şêweyan çêdike û kar di ber de dike . **D.R (9)**